31. İSTANBUL LGBTİ+ ONUR HAFTASI

İSTANBUL 2023 ONURHAFTASI

Em Mijara 31. Hefteya Rûmetê ya LGBTI+ ya Stenbolê Eşkere Dikin: EM VEDIGERIN

Em lubunyayen ku ji sala 1993an pe we bi çoşa xwe di kolan, tax, park, bexçe, kafe, restoran, bar, pub, meyxane, pastaxane û xanan da olan didin îsal cara 31. EM VEDIGERIN kadên giştî ku hûn ji me didizin.
Hûn bi salane dixwazin me ji kolanên me, taxên me, caddeyên me derxin; Em Vedigerin. Nîha carek din digel qedexe, zor û sansûran EM VEDIGERIN.

Wekî ku em berxwedana karkerên seksê yên trans ku di 1987da li derenceyê Parka Gezi yê greva birçîbûnê bi bîr tinin em meşên xwe yê ku bi hezeran me kolana tije kir ji bîr nakin. Em lubunyayê ku ji Hortum Süleyman heya Fotoroman Süleyman, li dijî zordarî û seravêtinên we ber xwe dide, her carî hêrsa me bi berxwedanê, yekbûnîyê, piştgirîyê tek dibin ji bîr nakin
Em ji vir Berxwedana Gezi yê ku sala 10. da xof dide dilê we û lubunyayên di dema berxwedanê da li dijî polîtîkayên înkarok û îktîdara AKP li ber xwe dan silav dikin. Îsal em carek din li vir in, EM VEDIGERIN.  EM VEDIGERIN Parka Gezi ye, Cade İstiklalê, Tarlabaşı yê, Kadıköyê, Gazi yê, Sulukule yê. EM VEDIGERIN malên me ye ku hatin morkirî, taxên xwe,  hêlîna xwe.

Li dijî ; transfobi, homofobi, bifobi, orospufobi, hivfobi, afobi, lezbofobi ku ji ber polîtîkayên nefretê ya dewletê roj bi roj zêde dibe û polîtîkayên ku li ser lubunyatîya me me tecrît dike, dewleta serdest a mêr, dorpêça polîsan EM VEDIGERIN

Ji sala 2015'an ve meş û çalakiyên me bi hincetên cuda tên qedexekirin. Em radigihînin ku iktîdara AKP ku di şevek da ji Peymana Stenbolê vekişiya derîyê gelek nefreta vekirîye û em bang dikin ku berpirsîyarê van hemûyan iktidara AKP ye. Polis di her fersendê da hêza xwe li dijî lubunya, jin+ an, kurdan, ermenîya, alevîya zêde dike. Em ji tundîya dewleta desthilatdar natirsin, em ji qadên ku hûn hewl didin me tehm bidin biger vedigerin. Em dev ji qadan ber nadin.

Eğitimden sağlığa, ulaşımdan barınmaya kadar her alandaki hak mücadelelerimiz ve direnişlerimiz sürüyor.
Ji perwerdeyê heya tenduristîyê, ji veguhastin heya hewînê li her heremê tekoşîna mafan û berxwedanên me didomin.

Em girtina BÜLGBTİ+, di 30. Hefteya Rûmetê ya LGBTI+ ya Stenbolê da  bi zora polis û dewletê binçavkirina 373 kesan, polîtîkayên înkar û asîmîlasyonê yên li ser gelê kurd ,zehmetîya gihîştina hormonan, qedexekirina 8ê Adarê Meşa Şeva Feminist  û 1 Gulanê qebûl nakin.

Em gelên xwe ye ku di erdhêja navenda wê Mereşê ye li Tirkiye, Kurdistan û Sûriyeyê bandor kiriye û di encama bêrêtî û bêhiqûqî ya dewleta mer hat katilkirin bi bîr tînin,  em radigihînin ku em ê hesab bipirsin. Trans dê we biqedînin. Hin rewşa kerxaneyên li bajarên erdhêje nedîyare, di heremê da newekhewî ya ku di serî da em trans LGBTİ+ an jîyan dikin rewşa nefretê ku em dûçar dibin derdixe holê. Li cihen hewînê ya giştî ku li gor zayenda te veqetandin da em ji alî dewleta ku bi hiqûqa dijminatî li ser me zor dike ve dûçarê cîhekarî, tehdît û tundîyê dibin. Transên ku terapîya hormon digrin û LGBTİ+ an ku bi HİV dijîn nikarin bigihîjn dermanên ku dive  her roj bigrin. Em trans, jin+, koçber, zarok, eqelîyet, LGBTİ+an di rewşên asayî da jî em bi tecrîd û tundiyê re rûbirû ne.
Em vê red dikin; EM bi hêrsa hevalên me yên ku we canê wan heşand, tune hesiband, kuşt û gelên ku we dengê wan nebihîst VEDIGERIN, dê hêrsa me we ker bike.

EM ji Meydanê VEDIGERIN Tünelê.

EM bi awayek bihêztir û birexistintir VEDIGERIN

Van rojên ku  li ser bedena me, rengê me, nasnameya me, jiyana me metingerî tê kirin em daxwazên xwe bi zelalî tînin ziman û dixwazin ev daxwaz pêk bên. Heta em mafên xwe bi dest nexin em berxwedana xwe didomînin. Em dê hesap bibînin. EM ji mafên xwe, xwebûna xwe û azadîya xwe VENAGERIN. Li dijî kesê kû hewl didin keskesor wekî hemana sûc nîşan bidin, em xwedî li keskesor derdikevin, em naxwazin kesek di winda bikin.

Em şahîd û mexdûrê tundîya cîhekarî, hedefgirtî, devkî û fîzîkî ku ji ali desthilatdarîyê ve bistratajî û awayek sistematik li dijî LGBTI+an tê sepandinê ne. Em radigihînin ku em li dijî ve tundî û polîtîkayên cîhekarî ne, em îdia û kapmanyayên we yên bêbingeh nas nakin. Em her dem li vir bûn, em li vir in û em ê li vir bin. Hûn ê herin.

Hinek li kolanê, hinek li çarxê de, hinek li ber mala xwe, hinek li ser rêyan, hinek bi hevjînê xwe re, hinek bi malbata xwe re… Em hevalên xwe yê  winda kir bi bîr tînin, em ê şopa wan hemûya bi bîr bînin. Em ê tekoşîna Zirve Soylu, Hande Buse Şeker, Palmiye Deniz, Dilek İnce, Eylül Cansın, Rojin Çiçek, Ahmet Yıldız û hevalen me yên ku ji ali dewletê ve hatin qetil kirin nedin ji bîr kirin.  EM bi agirê ku zalima dişewitîne VEDIGERIN qada.

EM îsal dîsa destê hev digrin û ji Meydanê VEDIGERIN Tünelê. EM bi piştgirî û tekoşînê  VEDIGERIN qadên xwe û kolanên ku her sal em nav û deng didin. Em di 31. Hefteya Rûmetê ya LGBTI+ ya Stenbolê da digihîjin hev.

Em dikîrînin, gumgumînin. Dibejin ku: EM VEDIGERIN EVÎNA MİN, VEGERE VEGERE VEGERE!